

Hejmara nû ya Kovara Zendê Derket Bi Nivîsên Balkêş Xemilandiye

Weşana sê mehî ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Zend bi hejmara xwe ya zivistanê derket pêşberî xwendevanên xwe.

Rêzepirtûk Zend gihîşt hejmara xwe ya 12'yan. Di vê hejmara Zivistan 2010'an de gelek nivîsên balkêş hatine weşandin.

Nivîskar Mustafa Borak li ser "Zargotin û rewşa pirtûkên gotinên pêşyan" nivîsandiye û di nivîsa xwe de nirxandin û hin pêşniyarên ji bo xebata li ser pirtûkên gotinên pêşyan kiriye.

Zimanzan Zana Farqînî di nivîsa xwe de "Zimanê muzîka kurdî ya nûjen" nirxandiye. Farqînî rexneyên giran li zimanê stranên bêjên nû dike û wisa dibêje, "Stranbêjên nû bi piranî ji aliyê zimanê kurdî ve nivîşkan in, telafûza wan derbexwerî ye. Ji bo ku zimanê xwe bi pêş ve bibin, di vî warî de xwe bihêvojin, gencîneya xwe ya peyvan xurt bikin, xwe ji bin bandora devokên herêmî derxin û bibin xwedî zimanê standard ê kurdî nakevin nav hewldanên berbiçav." Farqînî di warê şaşiyên ku têne kirin de hin mînak jî nîşan dane.

Êzîdîti yek ji olên kevn ên kurdan e. Li gelek parçeyên kurdan êzîdî hene. Nivîskar Konê Reş jî li ser parçeyê êzîdiyên rojava sekiniye. Konê Reş di nivîsa xwe ya bi navê "Êzîdiyên Cizîrê; Tirbespiyê, Amûdê, Serê Kaniyê û Heseke" de gotiye, "Ola kurdên me yên êzdî, ji kevintirîn olên dinyayê ye. Oleke kurdî ya orjînal e. Dia û nimêjkirina vê olê bi zimanê kurdî ye, Ev ol bi koka xwe li olên Hîndo-Îranî yên Mezopotamyayê vedigere. Ev oleke xweristî û serbixwe ye. Taybetiyeke vê olê ya kevneşopî jî ev e ku yên êzdî îbadetên xwe bi zimanê kurdî dikin." Û piştê li ser êzîdiyên herêma Tirbespiyê, Amûdê, Serê Kaniyê û Heseke sekiniye, navê eşîrên wê derê daye.

Zimanzan Haydar Diljen nivîsa, "Zarokên nûzayî bi zimane dê û bavê xwe gixînî dikin" weşandiye û li ser lêkolînên ku li Almanyayê û Fransayê li ser gixînî, qîjîn û giriyê zarokan hatiye kirin sekiniye. Lêkolîn dibêje ku qîjîna zarokan a herî pêşî, ji aliyê wî zimanê ku dema zarok hîn di zikê diya xwe de bûye bihîstiyê forma xwe digire.

Prof. Dr. Marif Xeznedar jî li ser "Mêjûya danîna alfabeya zimanê kurdî" ku nivîsa wî ji tîpên erebî adaptayî latînî hatine kirin.



Her wiha hevpeyvîna Samî Berbang a ku bi zimanzan Laura Shepherd re kiriye balê dikişîne. Laura Shepherd ku zimanzanekî amerîkî ye, piştî ku koçberên kurd ên li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê nas kirine hezkirina wê ya ji bo kurdî çêbûye û dest bi hînbûna kurdî kiriye. Di encamê de bi qasî ku gramerê binivîse hînê kurmançî û soranî bûye. Dûre pirtûkek wê bi navê "Soranî Kurdis Reader" derxistine niha jî pirtûka wî ya bi navê "Advanced Kurmançî Reader". Di hevpeyvîne de ew li ser zehmetiya kurdî û hin pêşniyarên di vî warî de disekine.

Her wiha Mamoste Marûf, Dilawer Zeraq, Aiwei Shi, Dr. Abdulwehab Xalid, Laura Shepherd, Mihemed Ronahî, Kerem Soylu, Amin Hesempur, Dr. Ba'iz Omer, Samî Tan, O. Jîgalîna, Doç. Dr. Galip Alçitepe, Reşîd Findî, Olga Jîgalîna bi nivîsên xwe keda xwe xistine nav kovarê.

Jeder: Diyarname